

Dumahîk : Ji konferansa..

mirovhezî û rêxistinên civaka sivîl geştir bibin, Kurd jî di van waran de li welatên xerîbiyê xwedî rol û beşdar bin, da ji pirsê gelê xwe re, bibine nûnerên kêrhatî, xwedî zarziman, hêja û hişyar.

Birano , hevalino...

Parta we li welêt di xebata xwe ya rojane de berdewame, û her dê berdewam be, nemaze siyaseta wê ya pîvayî li ba piraniya xelkê û bi taybetî li ba rewşenbîr û hişmendên ciyê rêzgirtinê ye, loma jî, rêxistinên heval û hogirên parta we li seranserê herêmên kurdî û gelek bajarên Sûriyê ên mezin, cî girtine û berfirehtir dibin, û li vê dawiyê, serkeftina lidarxistina kongira giştî ya şeşan a partiyê li welêt digel Bername, Tozik, helwest û belgeyên wê, nîşana vê yekê bû. Hêvî û bawerî li cî ne ku, em tev bi hev re karibin berjewendiyên gelê xwe li Sûriyê biparêzin, li rûmet û mafên wî yê netewî xwedî derkevin, û ligel hêzên niştimanî, demokratîk û rêxistinên civaka sivîl li Sûriyê, mil li mil, di siha Danezana Şamê de xebatê bidomînin.

Asteng û dijwariyên jiyana rojane di siha desthilatiya rijîma parta Bei's de, nebûna qanûnekê bona lisazxistina partiyên, ne jî ew ton hîlbijartinên ku rastiya viyan û dengdana hemwelatiyan berçav bike û bîne holê, bi serde jî diltengî, çavsorî, setem û zordariya hemereng di derbara hebûn û jiyana gelê kurd de..hwd , Vêca ev hemî tiştên he, dihêlin ku, em ji ya xwe nemînin û dengê xwe bigihînin gelê xwe û raya giştî. Lewre jî, hêvî di rêxistina heval û

hogirên li Ewropa, her dê li cî be ku, karibe bi her hawî ji xebata li hundir welêt re, bi alîkar û piştgir be, ne ku hûn beşekin ji siyaseta û avahiya partiyê û hew, lêbelê, li xerîbiyê, hestê mirovahî û gelheziyê dihêle ku hemî heval, dost û piştgir, bi dilsozî û dilên gerim rewş û pêvajoya gelê xwe li welêt bişopînin.

Nimûna karê hevpar di nav Kurdên Sûriyê de li welatên Ewropî, bi beşdarbûna ronakbîr û kesayetiyan serbixwe, di gel rêxistinên partiyên, li ba me, ciyê rêzgirtin û piştgiriya ye. Herweha li Sûriyê jî, parta me ligel parta Pêşveru û bi beşdariya gelek camêr û welatparêzên serbixwe û xwedî rol, karîbû li seranserê herêmên kurd û hin bajarên mezin mîna Şam, Heleb, Reqê û Heseke, Encûmenên herêmî ava bike, da ku bibe pêngaveke hêja li ser riya lidarxistina kongirekî niştimanî kurdî li Sûriyê ku , nûnertiyek jê peyda bibe û ji xebata gelê kurd re bibe lêvegereke kêrhatî, xwedî bername û siyasteke berpirsiyar û pîvayî be.

Di vê çerçewê de, li gor siyaseta û biryarên kongira giştî ya partiyê, em dixebitin û hewil didin ku, rojên li pêş ji guhertineke demokratîk re bin, ji gelê kurd û mafên mirovan re bin, ne ji çand û siyaseta şoven, nijadperest û pişaftina kurdan re bin.

Careke dî, Komîta rêvebir a partiyê bi dil û can, lidarxistina vê konferansê pîroz dike û serkeftinê ji we re dixweze.

Digel rêz û silavan. 17-5-2009 an

**Komîta rêvebir ya
Parta yekîtiya demokrat
a kurd li Sûriyê**

(YEKÎTÎ)